

Informationen für ausländische Hilfesuchende

Agahîyên ji bo biyanîyên ku li alîkarîyê digerin

Hûn ji welatekî biyanî hatine û hûn li benda zarokê ne. Da ku kesên ku derameda wan kême yan jî derameda wan qet nîne, bikaribin pêdivîyên bingehîn ên zarokê/a xwe terxan bikin, li Almanyayê hin alîkarîyên qanûnî hene.

Heger hûn penaxwaz- (**Asylbewerberin**) bin, hûn dikarin ji Dezgeha Alîkarîya Sosyal (Daîreya Biyanîyan) – **Sozialamt (Ausländerbehörde)** – ji bo pêdivîyên bingehîn ên zarokê/a xwe alîkarî werbigirin. Ev alîkarî dikare yan bibe alav û firaq (cil û berg û hwd.) yan jî pere/dirav be.

Heger hûn wekî penaber hatibin qebûl kirin (**anerkannter Flüchtling**), hûn dikarin li cem Dezgeha Kar û Xebat (**Jobcenter**) ji bo pêdivîyên bingehîn ên zarokê/a xwe serî li alîkarîyê bidin.

Heger hûn wekî hewelatîyeke dewleteke endama Yekîtiya Ewropî hatine Almanyayê, da ku hûn li vê derê bixebitin û derameda we kême be, hûn dikarin li cem **Jobcenter** ji bo pêdivîyên bingehîn ên zarokê/a xwe serî li alîkarîyê bidin.

Belgeya biryara li ser van alîkarîyên qanûnî yê ji bo pêdivîyên bingehîn ên zarokê/a xwe hûn bi baldarî hilînin.

Heger ev alîkarî têra we nekin, hûn dikarin li cem Weqfa **Thüringer Stiftung Hand in Hand** ji bo zarokê/a xwe serî li alîkarîyên lêzêde bidin. Divê hûn vê serlêdanê **berîya zayîna zarok** li cem dezgeheke şewirmendîyê ya ji bo ducanîyan bikin. Ji bo vê yekê belgeyên jêrîn hewce ne:

- Belgeya rewşa îqametê ( ji bo penaberan, penaxwazan)
- Belgeya îqametgehê li cem Daîreya Qeyda Îqametgehê (**Einwohnermeldeamt**) (Ji bo hewelatîyên Yekîtiya Ewropî)
- Cizdana Dayîkîyê
- Biryara **Sozialamt** yan a **Jobcenter** a derbarê alîkarîya malî, ku hûn mehane distînin
- Biryara **Sozialamt** yan a **Jobcenter** a derbarê alîkarîya malî, ku hûn ji bo pêdivîyên bingehîn ên zarokê/a xwe distînin

Heger hûn hemû belge bêtêmanî pêşkêşî dezgeha şewirmendîyê ya ji bo ducanîyan bikin, ewê serlêdana we bi rê kin Erfurtê. Li wê derê biryara her serlêdanekê bi serê xwe tê dayîn. Ji bo alîkarîya vê weqfê mafê qanûnî nîne an ku ji bo alîkarîyê hûn nikarin serî li dadgehekê bidin.

Heger Weqfê ji bo we alîkarîyeke qanûnî erê kir, ewê Thüringer Stiftung HandinHand ji we re nameyekê bi rê bike. Di vê nameyê de navên wan tiştan hene, ku hûn dikarin bi wî pereyî bikirrin.

Alîkarîya pereyî, ku ji bo we hatîye terxan kirin, yan ewê bişînin hesabê we yê bankayê yan jî hesabê dezgeha şêwirmendîyê. Dema ku pere ket hesabê dezgeha şêwirmendîyê ewê xeberê bidin we.

Alîkarîya pereyî ya vê weqfê dikare li gor pêdivîyê zêdetir be. Ev yek li gor rewşa şexsî ya alîkarîxwazan tê tespît kirin.

Divê hûn bala xwe bidin ser van tiştên jêrîn:

- **Heger hûn mala xwe bar bikin, divê hûn navnîşana xwe ya nû bi lezgîni bidin dezgeha şêwirmendîyê.**
- Herî dereng **4 hefte piştî zayîna zarok** divê hûn kopyayeke belgeya zayînê/belgeya çêbûna zarok- **Geburtsurkunde/Geburtsnachweise** bînin dezgeha şêwirmendîyê.
- Hûn dikarin bi vî pereyî **bi tenê wan tiştan bikirrin, ku di nameya Weqfê de hatine lîste kirin.** Yan na, pereyê wan tiştan, ku ne di nameyê de ne, divê hûn paş de bidin weqfê.
- **Belgeyên kîrînê** (fîşa kasayê, fatoreyên bi ispata dayîna buhayên alavan û hwd.) yê alav û firaqên ku hatine kîrîn, **divê hûn li cem xwe hilînin** an ku wenda nekin.
- **Mobîlya û cîhazên elektrîkî divê hûn** (li cem dikanekê yan jî ser înternetê) **nû bikirrin.**

Ji bo hemû pirsên we yê li ser ducanîbûn, zayîna zarok, pîrika zarokan, amadekarîyên ji bo anîna zarokan, ji bo pêşîlêgirtina ducanîbûnê, xebatkarên dezgeha şêwirmendîyê di xizmeta we de ne.